Berfanbar 2020

Agahî ji Rayedariya Tenduristiyê ya Danîmarkî li ser pêşniyara vakslêdanê ya li dijî COVID-19

Rayedariya Tenduristiyê ya Danîmarkî der barê vakslêdana li dijî COVID-19 de ji hemû welatiyên temen 18 salî re vê nameyê dişîne. Name agahiyên giştî digire nav xwe derheqê vakslêdana li dijî COVID-19 û bersivan dide hin pirsên we yên derheqê bernameya vakslêdanê û cihê peydekirina agahiyên rojane.

COVID-19 nexweşiyeke wisa ye ku dikare bandorê li herkesî bike. Nexweşî dikare ji bo hinan giran be, û vakslêdan dikare bibe alîkar ku pêşî li nexweşiyê were girtin. Vakslêdan dê di hewldanên me de ji bo kontrolkirina epîdemiya covid-19 de amûrek nû ya girîng be.

Vakslêdana li dijî COVID-19 dê hem bêpere be û hem jî bi dilxwazî.

Bi kurtasî:

- Vakslêdana li dijî COVID-19 dê di demeke kurt de dest pê bike, û di nava yên pêşîn de ku vakslêdan tê pêşkêşkirin welatiyên me yên mezin û karmendên tenduristiyê û hemşîre hene.
- Di destpêkê de, em ê ji bo her kesî bi têra xwe vaksînan bi dest nexin, û wê demek bikişîne beriya ku vakslêdan ji her kesî re were pêşkêşkirin. Dema ku dora we ya vakslêdanê hat, hûn ê bi rêya Digital Post a li borger.dk û e-boks.dk. bên agahdarkirin. Eger hûn ji wergirtina Digital Post re bêpar in, hûn ê nameyek ji postê bistînin.
- Herêm wê li seranserê welêt navendên vakslêdanê ava bikin ku piraniya welatiyan wê bikarin bên vakslêdan. Hin ji wan dê bi awayekî lokal bên vakslêdan, wek mînak, li malên hemşîreyan an jî li cihê kar eger personelên tenduristiyê yan jî karmendên hemşîretiyê bin.

Divê kî were vakslêdan?

Armanc ew e ku li Danîmarkayê ji bo her kesê ku vaksên wan hatine erêkirin vakslêdan were kirin. Em ne li bendê ne ku vakslêdan ji bo bikaranînê mecbûrî be, wek mînak jinên avis an jî şîr didin zarokan û zarok bi xwe, ji ber vê yekê vakslêdan li van koman nayê dayîn.

Di destpêkê de em ê ji bo her kesî bi têrê vaksan bi dest nexin. Ji ber vê yekê, em ê di destpêkê de pêşî li vakslêdana kesên ku herî zêde di bin xetereya nexweşiya giran a COVID-19 de ne bikin – tevî kesên pîr, nîştecîhên li xaniyên hemşîreyan, û kesên temenmezin ên ku ji ber şert û mercên berê an nexweşiyên heyî di xetereyê de ne. Her wiha ji bo personelên di tenduristiyê û lênihêrîna kal û pîran de yên ku bi kesên herî bêtalih û karên krîtîk re têkilî daniye dê pêşekî li wan bê girtin. Dîsa ji ber ku di sala 2021'an de vakslêdanên zêde tên kirin, wê li dijî COVID-19 hîn zêdetir kom bên vakslêdan.

Hûn ê çawa ji pêşniyarên vakslêdanê bên agahdarkirin?

Sazî an jî rêveberî wê nişteciyên li malên hemşîreyan û personelên di tenduristiyê û lênihêrîna pîran de agahdar bike. Heke hûn di xetereya bilindtir de ne, ji bo nimûne, eger hûn kal û giran in, hûn dikarin ji hêla doktorê xwe an jî ji hêla nexweşxaneyê ve bên têkildarkirin.

Ji kesên pîr re dê li gorî dîroka jidayikbûnê vakslêdan werin pêşkêşkirin û dê bi rêya Digital Post li borger.dk û e-boks.dk. bên agahdarkirin. Eger hûn ji wergirtina Digital Post re bêpar in, hûn ê nameyek ji postê bistînin.

Dema ku ji we re li dijî COVID-19 vakslêdan tê pêşkêşkirin, hûn ê agahdariya dema vakslêdanê jî bistînin. Eger divê hûn xwe ji vakslêdanê re binivîsin, hûn ê agahdariyê bistînin ka hûn ê çawa bikin.

Vakslêdan wê li ku derê pêk were?

Herêm wê li seranserê welêt navendên vakslêdanê ava bikin ku di piraniya wan de wê vakslêdan lê were kirin. Hin ji wan dê bi awayekî lokal derzî li wan were xistin, wekî nişteciîhên li malên hemşîreyan. Gelek karmendên di sektora tenduristî û lênihêrîna kal û pîran de dê li cihê wan ê kar werin vakslêdan – wek mînak li nexweşxaneyê, mala hemşîreyan an jî yek ji navendên vakslêdana herêmê. Kardêrê we dê we agahdar bike. Pisporên tenduristiyê û hwd ku li derveyî nexweşxaneyê dixebitin dê vakslêdan ji wan re li navendeke vakslêdanê were pêşkêşkirin.

Vakslêdan çawa dixebite?

Vakslêdanên pêşîn ên ku em distînin li ser teknolojiya mRNA ne. Vakslêdan pêşandana pergala parêzvaniyê dide ku vîrusa rastîn çawa xuya dike bêyî ku bibe sedema nexweşiyê, û ev pêşdîtin wext dide pergala parêzvaniyê da ku antîkorên hêzdar çêbike ku dikarin vîrusa rastîn bêbandor bikin eger hûn enfeksiyonê bigirin. Lê hê jî ne diyar e ka her kes wê bi temamî were parastin, û heta niha delîlên ku parastin wê heta kengî berdewam bike ji me re nehatiye peydakirin lê em ê li ser bingeheke domdar agahiyên zêdetir bi dest bixin. Ji kerema xwe pê bawer bin ku em ê tenê vakslêdanên pejirandî bikar bînin, ku tu vakslêdan ji bo bikaranînê destûr nayê dayîn berî ku hem karîn û hem jî ewlehî bi lêkolîn û ceribandinên zanistî yên berfireh bi tevahî bêne belgekirin, û feydeyên wê dê ji her bandorên neyînî zêdetir bin.

Di demeke dirêj de, wê gelek vakslêdanên cuda yên li dijî COVÎD-19 bên erêkirin. Di encamê de jî, dibe ku biguhere bê ka ji kîjan takekesî re kîjan vakslêdanan bê dayîn. Hûn dikarin li ser vê mijarê bêtir bixwînin di malpera înternetê ya Rayedariya Tenduristiyê ya Danîmarkî de, www.sst.dk/covid-vaccination-eng

Agahdariya bêtir

Hûn dikarin bêtir bixwînin û her gav agahdariya herî dawî li ser vakslêdana li dijî COVID-19 li malpera mebibînin: www.sst.dk/covid-vaccination-eng

Berdewam bin li pey rêberiya Rayedariya Tenduristiyê ya Danîmarkî

Herçende em dê di demeke nêzîk de bikaribin li dijî COVID-19 vaksînê bikin, lê demek ê bikişîne berî ku têra xwe mirov vakslêdan were kirin. Ji ber vê yekê, girîng e ku em hemû di mehên pêş de rêberiya gîştî ya li ser astengkirina enfeksiyona di civakê de bi berdewamî bişopînin:

Rêz û silav,

Søren Brostrøm
Gerînendeyê Gîştî, Rayedariya Tenduristiyê ya Danîmarkî